Dr Nûredîn Zaza
1919 - 1988

NEWROZ

Osman Sebrî
1905 - 1993

Xebat ji bo : *** Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.**
*** Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.**
*** Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya wel[êt de .**

Ji *weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê - YEKÎTÎ*
Email : **Newroz95@hotmail.com**

Hejmar(67) Nîsan 2006 z-2618 k Buha (15) p.s

Şerxwazî Pirsa Kurd Çareser nake

Bûyerên gerim û balkêş, yên ku li vê dawiyê li Turkiyê, Îran û sînorên Kurdistana Îraqê hatibûn holê, ciyê rawestina siyasetmedar, rojnemevan û dewletan bû.

Medya Turk, bi her awî diqîre û dike şemete: ((Haho, Îraq parçe dibe, Kurd li wir dibine dewlet, birayên me yên Turkmen li Kerkûkê ji dest hêzên Talbanî û Barzanî ne di tu halî de ne, ... Terorîstan li dijî cimhoriyeta Turkiyayê xwedî dikin....Û H.W.D.)) . Di siha piropagendeke weha de, bi dehezaran leşkerên Turkiyê berê top û tangan didine herêma Kurdistana federal, tevdîr û haziriyên hêrişênmezin dikin. Vêca di ber re jî, hêzên dewleta Îranê ji hêla xwe ve, dest bi hêrişan kirine, gelek gund û bajarokên Kurdistana federal bombebaran dikin. Baş dixuye ku, aştiya li Kurdistana Îraqê, li hevkirina herdu hêzên sereke, PDK û YNK, rêkeftin û gavavitina bi hêla yekirina herdu îdarên Hewlêr û Silêmaniyê bi seroktiya Nêçîrvan Barzanî û rêbertiya kak Mesûd, nûkirina seroktiya Mam Celal ji Îraqê re, li dirêjiya \ar salên dî, li ba karbidestên Anqerê û Tehranê ciyê xemgîniyeke mezin e. Lewre, çavsor dibin, bi dijayetî li hebûna pirsa Kurd dinêrin û loma berê xwe didine şer û xwînrijandinê.

Di çarçewa vê pêvajoyê de, ji bîra nebe ku, rola rijîma Be's li Sûriyê çendî ji rola Şranê re alîkar û piştgire û bi kêrî pir lîstikan tê .

Sînorê Yekta

Reş û Sipî

Weke tê zanîn ku, gava

bivek bi ser welatekê ve tê, destlat bi her awî li xwe vedigere û têkliyên xwe bi milet û hêzên wê re xort deke, daku kanibe li hember wê bivê reaweste. Lê mixabin, deslata Sîriyê tersî vê zagonê diçe. Çiqas biv bi ser me de tên, ewqas har û bi hêrs dibe û detst dide ser hemwelatiyên xwe.

Di heyva Avdarê de, bi dehan rewşenbîr, welatparêz û partîzanan, mîna :- Nivîskar **M. Xanim - Elî Ebdela** û hedu kurên wî - **Semêr Neşar** û li vê dawiyê , xebatkar **Fatih Camûs jî , ew** hatine binçav kirin**.**